Rastî-rûpel

# Gilîkirinên ligor Qanûna Neheqiyên Nijadî the Racial Discrimination Act

## Qanûna Neheqîkirina Nijadî Racial Discrimination Act çi ye?

Qanûna Neheqîkirina Nijadî, *Racial Discrimination Act 1975 (Cth) (the RDA)* dan-û-stendina ne-adilmend bi te re (mu’amelekirina ne baş) dike kiryareke li dij qanûnê, ger ji bo van sedeman be: nijda te, rengê te, pêşiyên te (selalet), paşerehên te yên neteweyî yan etnîk, yan mekaneta te wek koçber.

Ew kîna nijadî (nijadperestiyê) jî dike kiryareke li dij qanûnê.

## Ev qanûn dikare kengê bihêt bikarhanîn?

Dikarî qanûna Neheqiyên Nijadî *(RDA)* bo bidestxistina dan-û-stendina (mu’amelekirina) adilmend di gellek rewşên jiyana giştî de bi kar bihînî:

- **Karkirin** – bidestxistina karekî, şert û mercên karekî, fêrkirina meslekî *(training)*, tereqqîkirin *(promotion)*, derxistina ji kar.

- **Perwerde** – Xweqeydkirina bo xwendinê li xwendegeheke prîvat, yeke giştî (hukûmetî), kollêjê *(college) yan zanîngehê.*

- **Xanîgirtin** – kirêkirin yan kirrîna xaniyekî yan apartmanekê.

- **Bidestxistina yan bikarhanîna xizmetan** – mîna xizmetên bankan yan sîgortsyê, xizmetên daîreyên hukûmetî pêşkêş dikin, xizmetên neqliyatê yan peywendiyên têlî *(telecommunication)*; her weha xizmetên meslekî wek yên parêzgeran (abûqatan). Pijîşkan (doktoran) yan pîşekaran (sin’etkaran), xizmetên ji xwaringehan, firoşgehan (dukanan) yan şûnên demderbaskirinê.

- **Têketina şûnên giştî** – wek parkan (baxçeyan), daîreyên hukûmetê, xwaringehan, otêlan, navendên kirrînê *(shopping centres).*

## Neheqîkirina (cudayîkirina) nijadî çi ye?

Neheqîkirina nijadî cîh digire dema dan-û-stendina (mu’ameleya) bi kesekî/kesekê re ji yên bi kesên din yên di heman rewşê de cuda be, ji ber sedemên nijadî, rengê wan, pêşiyên wan (selaleta wan), paşerehên neteweyî yan etnîkî, yan mekaneta koçberî. Bo nimûne, ew ê neheqîkirineke nijadî ya rasterast be, ger delalekî xaniyan kirêkirina xaniyekî nepejirîne (qebûl neke) jiber cudatiya paşereha yan rengê kesên kirêkirinê dixwazin.

Neheqîkirina nijadî her weha cîh digire dema rêberiyeke yan siyaseteke ku ji bo her kesî wek hev e lê bandoreke ne adilmend digihîne hinekên ku nijad, reng, selalet, paşerehên wan yên

neteweyî yan etnîkî, yan mekaneta wan ya koçberî cuda ne. Ji vê re 'cudayîkirina/neheqîya ne rasterast' dihêt gotin. Bo nimûne, ew ê neheqiyeke ne rasterast be ger şirketek biryarê bigire ku navêt karkerek kum yan tiştekî din dema kar bide ser serê xwe, jiber ku ev bandoreke ne adilmend digihîne kesên ji hinek paşerehên nijadî/etnîkî.

## Kîna nijadî (Nefreta nijadperestî) çi ye?

Kiryareke giştî (kirineke li pêş xelkê) li dij qanûnê ye ger li ser bingeha nijad, reng, paşereha neteweyî yan etnîkî ya kesekî yan komeke ji kesan be, kiryareke ku mumkin e **hêrskir, îhanetkir, şermezarkir yan tirsafer be**.

Hinek ji nimûneyên kîna nijadî dikarin tiştên weha bin:

- belavkirina tiştên hêrskir (matiryalê ku dikare kesekî/kesan hêrs bike) di înternêt de, wekî di nav komên înternêtî *e-forum, blogs* û malperên civatî *social networking* de û parvekirinên vîdyo
- têbiniyên yan wêneyên bo kesekî/komekê ziyanafer di weşanên wek rojnameyan, kovaran, yan belavokan de
- axaftinên hêrîşbir di meşên giştî de
- peyvên riswakirinê li şûnên giştî, wekî di firoşgehekê de, li şûna kar, parkan, neqliyatên giştî (wekî di trênan û otobûsan de), yan li xwendegehan
- peyvên riswakirinê ji aliyê werzişvanan, temaşevanan, serpereştan yan berpirsan ve dema çlakiyên werzişî.

## Kengê kiryareke hêrîşker/hêrskir (offensive behaviour) ya li ser bingeha nijadî ne li dij qanûnê ye?

Qanûna Neheqiyên Nijadî *(RDA)* hewl dide balansê têxe navbera axaftina azad û mafê jiyana ji kîna nijadî dûr. Bi dîtina *RDA* nimûneyên li jêr ne li dij qanûnê ne ger **"bi awayekî m'aqûl û bi mebesteke ne xirab"** hatibin kirin:

- **berhemeke yan rolgirtineke hunerî –** bo nimûne, şanoyeke ku tê de helwestên nijadî yên hêrîşbir/hêrskir ji aliyê rolgirekî ve dihên ragîhandin
- **ragîhandineke, weşandineke, gengeşekirineke yan guft-û-gokirineke *(debate)* ku rast ji bo armancên akadêmî û zanistî ye** – bo nimûne, gengeşekirin û guft-û-gokirina siyaseteke giştî ya derhqê koçberiyê, pirrçandiyê yan mijarên xwe bi hinek koman ve girê didin
- **amadekirina raporteke adilmend û durist derheqê mijareke bo berjewendiya civatê de** – bo nimûne, raporteke adilmend derheqê kiryareke nijadî di rojnameyekê de
- **ragîhandina têbiniyeke ma'qûl**, ger têbinî rastiya baweriya xwediyê xwe be.

## Çi dikarim bikim ger pêrgî cudayîkirinê (neheqiyeke ji ber sedemên nijadî) û kîna nijadî bihêm?

Heye ku bixwazî derheqê wê de rasterast bi kesê/kesên kiryar kirine re biaxafî.

Ger ev kêşeyê çareser neke, yan axaftina bi wan re bo te ne hêsan be (ne rehet be), dikarî li nik (li cem) Encûmena Australî ya Mafên Mirovan *Australian Human Rights Commission* gilî bikî ('şikayet'). Dikarî her weha kesekî wek parêzger (abûqatekî), yan sendîgehkê bo xwe bikî nûner.

Gilîkirina li nik Encûmenê bêpere ye (belaş e, xurayî ye).

Gilîkirina te divêt nivîskî be. Encûmenê formeke gilîkirinê heye, dikarî dagirî û bi postayê yan bi faksê rêbikî; yan bi rêya înternêt ji malpera Encûmenê gilî bike. Ger nikarî nivîskî gilî bikî, em dikarin alîkariya te bikin.

Da ku gilîkirina te ma'qûl be, divêt bi awayekî mentiqî weha raber bikî ku kiryara tu derheqê wê de gilî dikiye neheqiyeke li dij qanûnê ye; û divêt tu têbiniyên rêk-û-pêk derheqê rûdanê de bidî, şîrovakirina ka çi bû, kengê û li ku bû jî di nav de, û navên kesên e'leqedar.

Gilîkirin dikare bi her zimanî be. Ger te wergêr divêt, dengî yan nivîskî, em dikarin tevdêrê bo wê bikin (organîze bikin).

## Dikarim ji ku bêtir agahdarî bi dest xim?

Agahiyên bo peywendîgirêdana bi Encûmena Australî ya Mafên Mirovan re:

**Telefon**
Xizmeta Neteweyî bo Agahdarkirinê: 1300 656 419 yan (02) 9284 9888
TTY (telefona bo peywendîgirêdana bi nivîs): 1800 620 241 (bêpere ye)
Faks: (02) 9284 9611

**Posta**
GPO Box 5218
Sydney NSW 2001

**Înternêt**
Email: infoservice@humanrights.gov.au
Malper: www.humanrights.gov.au

Bo gilîkirina bi rêya înternêt
www.humanrights.gov.au/complaints_information/online_form/index.html.

Ger kerr bî yan kêşeyên bihîstinê bi te re hebin bi rêya TTY peywendiyê bi me re deyne, li ser vê jimarê 1800 620 241. Ger wergêrekî Auslan (wergêrên bo kerran) bo te divêt, em dikarin tevdêrê bo wê bikin (organîze bikin).

Ger kor (kûr) bî yan kêşeyên dîtinê bi te re hene, em dikarin agahiyan bi awayekî din bidin, ger bixwazî.

## Şûnên din bo gilîkirina derheqê kîna nijadî de

Ger bo naveroka ne-adilmend (hêrîşbir, hêrskir) di weşanên mîdyayê de, yan ji dezgehên ragîhandinê, yan di naveroka weşanên înternêtî de, xemxwar bî, dikarî li nik dezgeha bo mîdyayê berpirs *The Australian Communications and Media Authority (ACMA)* gilî bikî*;* yan *the Advertising Standards Board for advertisements* (bo reklaman)*;* yan *the Australian Press Council* bo naveroka organên çapemeniyê. Dikarî her weha li nik edîtorê rêxistinê/dezgehê yan birevebirê wê gilî bikî.

Ger ji kiryarên hêrîşker/hêrskir *(offensive behaviour)* yên cînaran (cîranan) xemxwar bî, dikarî peywendiyê bi Navenda Adilmendiya Civatî *Community Justice Centre* re deynî, bo derheqê çareserkirina kêşeyê de alîgir be, yan bi Daîreya Bicîhkirinê *The Department of Housing* re, ger xaniyê te di nav xaniyên giştî de be *(public housing).*

**Ger gefxwarinên bikarhanîna zorê li dij te hebin yan hêrîşeke bi zordarî li dij te cîh bigire, polîs agahdar bike.**

## Şîreta (pêşniyaziya) qanûnî ya gelemper

Ger tevdêra gilîkirinekê dikiye, heye ku bixwazî şîretên qanûnî bi dest xî, yan peywendiyê bi sendîgeha xwe re deyne. Xizmetên şîretên qanûnî bo civatê (c*ommunity legal services)* dikarin bêpere şîretan derheqê neheqiyan û tengasiyên ji kesan de bidin. Agahiyên bo peywendîgirêdana bi nêziktirîn Navenda Xizmetên Qanûnî bo Civatê re li vir bi dest xe www.naclc.org.au/directory.

**Ne-berpirsî: Agahiyên di vê rastî-rûpelê de tenê bi armanca rêberîkirinê ne. Ne berdêlên şîretên qanûnî ne.**